Kadim Akademi SBD
Sosyal Bilimler Dergisi | Journal of Social Sciences

DAWOD FETTAH, Dilêr (2018), "Têgeha Eşqê Di Şiîra Melayê Cizîrî De",
*Kadim Akademi SBD,* C. 2, S. 2, s. 146-163.

*Makale Geliş Tarihi: 24.08.2018 / Makale Kabul Tarihi: 18.11.2018*

# TÊGEHA EŞQÊ DI ŞIÎRA MELAYÊ CIZÎRÎ DE

## *THE CONCEPT OF LOVE IN MELAYÊ CIZÎRÎ'S POETRY*

**Dilêr DAWOD FETAH***



**KURTE:** Mijara Eşqê di helbesta klasîk ya kurdî de cihekî giring girtiye û bi taybetî di xezel û mesnewîyan de. Nexasim di dîwana Melayê Cizîrî de eşq û ciwanî jêdera hebûnê ye, ji ber ku sofiyan bi rêka Wehted Elwicûdê li mijara eşqê nihêriye û ew eşqa xwedê di her hebûnekê de dibînin. Ev xebat jî lêgerînek e bo çemka eşqê di şiîrên Melayê Cizîrî de û diyarkirina nêrîna wî ye derbarê eşqê de.

Ev xebat du tewerên sereke bi xwe ve digire. Di tewerê yekê de têgeha eşqê hatiye zelalkirin û piştra behsa eşqê di meydana felsefî, sofîgerî û ayînî de hatiye kirin. Di tewerê duyem de eşq bi awayekî piraktîkî li ser binbeşên Eşqa Heqîqî, Xweda û Teceliya Zatê Xwe (Eşqa Taceliyê), Ûnsirê Pêncan, Eşqa Mecazî û Agirperestiyê di dîwana Cizîrî de hatiye kirin.

**Bêjeyên Sereke:** Eşq, ciwanî, Melayê Cizîrî, tesewif, felsefe, şiîr.

**ABSTRACT:** Love is a dominant theme in classical Kurdish poems especially in the lyrical and epic poems. Malaye Jiziri is considered to be the most influential Kurdish poet who regards 'love' (eşq) and 'beauty' as the source of existence. This is due to the fact that mystical poets used to discover or conceive the essence of God in everything they encountered in their lives. This research is about the "love" in the poems of Jiziri, it attempts to show the type of love that the poet gives life to and it also delineates his different views on it.

This study is made up of two chapters, in the first chapter the idea of love is explained from philosophical, religious and mystical points of view, while in the second chapter the subject of love is explained in connection with true love, divine love (the fifth element), metaphoric love and fire worshiping love.

**Key Words:** Love, beauty, Malaye Jiziri, epic poems, philosophy, poetry.

* Derçûyê lîsansa bilind ji Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî. *dilerduski@yahoo.com*
ORCID 0000-0003-2294-7791

## DESTPÊK

Melayê Cizîrî yek ji şairên herî navdar yên kurd e, navê wî bi dirustî Ehmed e û navê babê wî Mihemed e. Cizîrî ji malbata Ensarîyan e ku malbateke herî navdar e li Cizîra Botan û her li Cizîrê hatiye dunyayê (Xeznedar, 2010: 298). Sebaretî sala ji dayikbûna wî nêrînê cuda hene lê nêrîna Seydayê Mela Ehmed Zivingî ji hemû nêrînan baştir e dema dibêje: Cizîrî li sala 975 (Mişextî) (beramberî 1567-1568 Zayînî) li Cizîra Botan ji dayik bûye (Cizîrî, 2005: 21). Mela ji bo xwandin û zanînê gelek geriyaye, çûye bajarên weke Amêdî û Colemêrg û Amedê û paşê îcazeya melatiyê li cem mela Tahirî distîne û dibe Mela (Jiyan, 2015: 33). Belê li dawîyê vedigere bajarê xwe Cizîrê û li Medreseya Sor dersan dide feqiyan û ta mirina xwe (1050 Mişextî/1640 Zayînî) li wir dimîne.

Weke diyar e Cizîrî bi tenê xwedî dîwaneke şiîran e ku bo yekem car ji layê rojhilatnasê elmanî Martin Hartmann di sala 1904an de li Berlînê hatiye çapkirin. Gelek rave û şirove bi zimanê erebî, farisî û kurdî bo şiîrên Cizîrî hatine kirin lê şerha ji hemûyan kevintir şerha Mela Yehyayê Mizurî (1772-1836Z) ye, bi zimanê farisî ji bo qesîdeya "Muxbeçeyên Meyfiroş" kiriye (Mehmûd, 2014: 57-58).

Cizîrî di şiîra xwe de nasnavê Nîşanî û Mela bi kar înaye, sebaretî nasnavê Nîşanî Seydayê Mela Ehmed Zivingî dibêje: "Nîşanî dibe palvedan bît bo Nîşanî ku bi ramana armancê dihêt, anku ew yê bûye armanca tîrên eşqê yan jî armanca nexweşî û giriftan ji ber eşqa xwe". Xuya ye ku Cizîrî nûnerê herî giring yê eşqê ye di helbesta klasîk a kurdî de, lê evîndariya wî ne wek evîndariyeke dî ye, eşqeke têkel e di gel felsefe û sofiyatiyê (Cizîrî, 2005: 23). Cizîrî di dîwana xwe de mezhebek li ser binemayê eşq û viyanê ava kiriye û her kesek li ser binemayê wê eşqê dikare bîjî bêyî ciyawaziya ol, nifş û netewan. Mela dilî dike navenda eşqa xwe û eşqa heqîqî ku eşqa Xwedê ye di dilê xwe de dihewîne. Cizîrî li ser eşqa xwe gelek derd û azar kêşane. Ew bi xwe jî dibêje: "xelk dibêjine min tu ateşperest î, lê nizanin ku ez evîndarê eşqeke rast û dirust im", Her ji ber van sedeman ev xebat pêkolek e ku eşqê bi dîdgehên sofîgerî, felsefî, olî û lojîkî li cem Melayê Cizîrî bide diyarkirin. Bi vê yekê me mifa ji rêbaza wesfî û şirovekarî wergirtye û li ser dîwana Cizîrî analîz kiriye.



### 1. Eşq Çi ye?

Eşq ew alî ye ku nayê dîtin. Eger tiştan du alî hebin, du cur bin diyar (dîtin) û nediyar (nedîtin), eşq dikeve di sînorê nedîtinê de. Her ji ber vê sedemê ne hêsan e em xûdê eşqê bi xwe nîşan bidin, anku pênasekirin û bercestekirina eşqê karekî gelek giran e û ew bi tena serê xwe meydaneke berfireh e û mirov nikare bi sanahî wê bide naskirin. Bi gotina Ebuîshaq Karzunî, eşq hebûn e, eşq ezmûn e û peywendî bi aliyê ruhî yan menewî yê mirovî ve heye (Edhem, 2017: 23). wate eşq tiştek e bi çav nahê dîtin, belku hest pê dihêt kirin, anku eşq birîtî ye ji hestkirin, derdkêşan û serencrakêşan beramberî kesekî yan tiştekî, ew kesên aşiq dema hev dû dibînin, laşê wan dest bi derdan hormona oxytocin dike û ev hormon bi hormona aşiqên nasyar e (Kabilan, 2014: 220). Mirov dikare bêje her dem eşqa mirovî bo tiştekî ciwan, nazik, buha, serincrakêş yan jî hunerek ciwan weke wênekêşan, nexşe, zarvekirin, muzîk yan her tiştê kartêkirinê li mirov dike, diçe (Kimale,

1978: 21). Weke dihê zanîn eşq ji du regezên tevlihev dirust dibe: regezê nefsî û regezê zayendî. Belê hêza yekê ji ya duyan xurttire û kontrolê bi regezê zayendî dike. Di meydana felsefî, sofîgerî û edebî de eşq xwedî dîrokeke kevnar e û gelekî li cem fîlozof û mitesewif û şairan hatiye behskirin bi taybetî li cem sofiyan. Wan pêkol kiriye kontrola regezê zayendî ya eşqê bikin û bibin evîndarên nefsî, her ji ber vê çendê wan pena ji bo eşqa Xwedê biriye, da ku vê valatiya eşqa dinyayî pê tije bikin û ev çend jî ji hêla piskolojiyê ve cihê pirs û nîqaşê ye. Bi vê sedemê Suhrewerdî dibêje: "Eşq û muhbet peywendî bi ciwanî û zewqê mirovî ve heye û ev jî tiştek xudî ye, bi watayeke dî, eşq yek e ji derkeft û teceliya hebûnê, ku wate eşq diyardeyeke derveyî mirovî nîne. Belku xetîrek e di derûnê mirovî de, her ji ber vê çendê gewher û naveroka mirovî ye berî cesteyî û aliyê madî" (Edhem, 2017: 25). Weke diyar e eşq ne tenê di navbera du kesan (cins) de ye û wate eşq ne tenê eşqeke şehwanî ye belku dibe mirov bibe evîndarê eşqeke ruhanî û nefsî (Kimale, 1978: 21). Ev jî gelek li cem arif û sofiyan reng vedaye. Mitesewif eşqa insanan li ser du beşan dabeş dikin: eşqa mecazî û eşqa heqîqî. Eşqa mecazî eşqa li hember cinsê dîtir e, eşqa heqîqî jî eşqa Xwedayî ye (Adak, 2015: 129). Eşq bi qonaxên xwe yên dîrokî gelek berfireh û berbelav bûye û xwe xistiye di nav piraniya biwarên jiyanê de.

**2. Eşq Li Cem Fîlozofan**

Dema mirov li dîroka mirovatiyê dinêre dikare bibêje mirov bi xwe karêkterek aşiq e, karkirin û xebatkirina mirovî, dîsa mirov her dem xwe ji kawdan û nexweşiyên dunyayê diparêze û hez nake bimire, ev hezjêkirina mirovî ji bo jiyanê dibe sedem ku mirov bi xwe yekem car evîndarê canê xwe bûye, berdewam li wan rêkan geriyaye yê temenê mirovî pê dirêj bibe, weke çawa Gilgamêş li nemiriyê digere û hez nedikir bimire. Lê di heman demê de mirovî hindek caran heza mirinê jî hebûye dema Mîr Mihê ji sefera xwe vedigere, dibîne ku yek ji hevalên wî nemaye, wê demê hez dike bimire, wate mirov her li dawiyê dibe êxsîrê qedera xwe.



Peywendiya eşq û hebûnê gelek li cem fîlozofên yewnanî hatiye behskirin û bûye mijarek di navbera fîlozofên wê serdemê. Fîlozofê yewnanî Empedocles, ku berî mesîhî bi çar sedeyan jiyaye, yekem kes bû Atifa mirovan bo hişkatîyê zivirandî, ew bo hindê çûye ku hemû hêzên siruştî yên wekî felekî û kimyayî her îradeya mirovî bi xwe ne, heger çi ew wekî wan temam nebin jî. evînî û neviyane dijwartirîn Atifa desthilat li ser mirovî û ew in karîger di rêvebirina karûbarên gerdûnî de. Her ew dibêje her çar regez ax, av, ba û agir bi kartêkirina eşqê têkelî hevdu bûn û bi şûn de neviyan çû di hindurê wan de, lew ew jêk vebûn û bûn gelek reng û şînkatî û canewer jê peyda bûn li dû hev. Û ev çê kiriye beriya hingî ji hevdu cudabûn paşî eşqê ew gihandin hev ew leşê giyandarên nûke ji wan dirust bûne (Kimale, 1978: 14). Li dûv vê nêrînê eşq ew hêza karîger e ya di navbera wan regezên cuda de kar dike.

Weke diyar e fîlozofan beriya her kesî zaravê eşqê daye naskirin û her yekî bi nêrîna xwe eşq pênase kiriye. Wek fîlozofê Yunanî Pythagoras dibêje: "Eşq hêzek e ku jêderê wê yê sereke dil e" (Kimale, 1978: 11). Eşq bi hest û sozan ve girêdayî ye ne ku bi eqlî ve. Socrates jî dibêje: Eşq baştirîn werzişa canî ye, Galen weke nojdarekî dibêje: Çawa bedena

mirovî pêdivî bi werzişê heye, wesan eşq jî baştirîn werzişa canî ye, wate herdu fîlozofan eşq bi aramiya derûnî destnîşan kirine.

Fîlozofê mezin yê yewnanî Plato gelek li ser vê mijarê rawestaye û bi dîtina wî eşq hêza peywendiyên di navbera regezan (cins) de dupat dike û îradeyek cêgir e di navbera du regezan de û wan her duyan dike yek. Bi dîtina wî eşq hêzeke xerîzî ye û girêdayî ye bi giyandaran ve (Kimale, 1978: 7). Feylesovê yewnanî Leo Italy li sedê 16 yê zayînî jiyaye, eşqê dike sê beş: eşqa siruştî, eşqa hestan û eqlî. Derbarê eşqa yekê de wek çawa robar diherikine ser deryayê û ber bi erdê ve dimînin û zivirîna sitêrkan li dor rojê, ev eşqek siruştî ye di navbera kaînatan de, lê ya duyan eşqa giyandarên yek regez e bo hevdu û Ya sêyem eşqa di navbera çêkerên xwedan mêşk de wekî mirov û firîşteyan (Kimale, 1978: 14). Ev polînkirina eşqê hêza eşqê li nav her kaînek li ser erdî dupat dike. Wek diyar e her fîlozofekî bi nêrîna xwe eşq daye diyarkirin weke hêzek ku di navbera yek yan du regezan, nifşan hwd de kar dike. Vê jî gelek bandora xwe li cem Sofîgeran hiştiye. Bi watayeke giştî eşq bi nêrîna fîlozofan meyla mirovî ye ji bo kesekê yan tiştekê xweştivî û serincrakêş yan bi mifa (Hisên, 2011: 110). Ev bi hev girêdana eşqê bi pirsa hebûnê ve ji hêla fîlozofan ve gelek bandora xwe li ser sofîsizmê hiştiye û bûye mijarek giring li cem sofiyan.

### 3. Eşq Li Cem Ayînê Îslamê

Di ola îslamê de giringiyek baş bi eşqê hatiye dan, têgeha eşqa xwedayî di ayîna îslamê de girêdayî ye bi Qorana pîroz ve (Esaf: 2). Weke diyar e di gelek ayetên Qorana pîroz de hatiye, tê de eşqa Xwedê ji mirovên momin daye diyarkirin weke hatî "والله يحب الصابرين" yan "والله يحب المحسنين" yan jî "فان الله يحب المتقنين" ev jî wê peywendiya eşqê ya di navbera Xwedê û ebdên wî de xuya dike (Esaf: 7). Ev eşqa Xwedê ji bo beniyên wî ji bo van egeran dizivire "Weke sîfetek ji wî, başî , xwezivirîn, paqijî, îbadet, bêhnfirehî, cîhad di rêya xwedê de û hwd" (Îzwîlî, 2013: 248). Lê beramberî vê çendê divê eşqa mirov ji bo Xwedê gelek berfirehtir be, ji ber ku ew çêkerê her tiştî ye û bawerî û eşqa xwedê di ayînê îslamê de beriya her tiştî dihê. Lewma jî çendîn bizavên zuhd û tesewifî her ji ber vê yekê peyda bûne.



Ayinê îslamê weha li eşqê dinêre weke diyardek fitrî girêdayî bi deruna însanî ve û eşq dabeşî sê merteban kiriye.

1. Eşqa Berz: Viyan bo Xwedê û cenabê pêxember
2. Eşqa Navend: Viyan a Dayik û Bab û Xuşk û Bira
3. Eşqa Normal: Viyan ji bo heval û dostan di rêya Xwedê de û cîhad bo serketina dînê Xwedê (Ilwan: 9).

Wate dînê îslamê eşq weke amrazekê danaye di navbera mirov û Xwedê de. Çunke mirov bi eşqê digihe pileya here bilind ya Atifî, ev eşq weke diyardeyeke xerîzeyî li cem her mirovekî heye her yek ji bo mebestekê bi kar diîne. Wek diyar e dil bi bingehê eşqê dihêt binavkirin û mirovên îmandar jî bi zikrê Xwedê dilê wan aram dibe û dîsan di ola

îslamê de dil navenda îbadet û eşqa Xwedê ye û dema kesek misilman ji riya Xwedê derdikeve dibêjinê dilê wî reş bûye.

**4. Eşq Di Tesewifê De**

Tesewif diyardeyeke bihêz ya dînî ye, destpêka wê vedigere ji bo sedê IX ê miladî, her ji wê serdemê ta nuha gelek berfireh û berbelav bûye li seranserî cîhana îslamî û çendîn şair bûne hilgirê vê bizavê (Miradî û Îlahî, 2011: 110). Weke diyar e yek ji hokarên peydabûna tesewifê peydabûna bizava zuhdê bû û hokarên sereke yên bizava zuhdê xwe dûrxistin bû ji şehwet û xweşiyên jiyanê û karkirin ji bo roja dawîyê "Qiyamet" wek diyar ew kesên di nav van de bi sofî dihatin binavkirin û armanca wan bi tenê zikirkirin û ebdîniya Xwedê bû. Lê ewên ku digihîjin pileyeke bilind ya zanîn û irfanê bi 'arif dihên binavkirin. Wate hemû arif sofî ne lê hemû sofî ne arif in.

Eşq weke mijareke berfireh cihekî mezin di tesewifê dê giritiye û Ibin Elerebî dibêje: "Bi tenê eşqek heye ew jî eşqa Xwedayî ye ew tiştê di hebûnê de ciwan, hemû ji xweşikbûna Xwedê ye" (Nîwa, 2011: 60). Wate hebûna her kaîneke dî di rastiya xwe de hemû ji xeşikbûna Xwedê ne û bi nêrîna mitesewifan bi tenê hebûnek heye ew jî hebûna Xwedê ye. Ew kainên dî hemû tunene û hebûna wan mecazî ye.

Ebu Talib Al-Mekî dibêje: "Eşq berztirîn pileya kemalê ye ku arif dighîjinê û ev jî viyanek e Xwedê daye ebdê xwe yê çak"(Esaf: 7). Bi nerîna mitesewifan dil navenda eşqê ye û arif û mitesewif bi rêka eşqê digehin rastiyê (Nîwa, 2011: 60). Eşq li gorî tesewifê ne meseleyeke fikrî ye, meseleyeke wijdanî û hestyarî ye. Mirov nikare rasterast eşqê terîf bike. Eşq tiştekî sobjektîf e. Weke Mewlana Romî dibêje: "Eqil di vê meseleyê de weke kerekî ku ketibe nav heriyê neçar maye" (Filiz, 2015: 65).



Tesewif li ser binemayê Wehdet Elwicudê ava bûye û felsefeya Wehdet Elwicudê jî bi saya eşqê dixwaze xwedê nas bike. Li gorî miteswifan Xwedê ji xweşikbûna xwe tecelî kiriye, her wek di hedîsa qodsî de hatî: (كنت كنزاً مخفياً فأحببت أن أُعرف فخلقت لكي أعرف) Wate "ez xezînek veşartî bûm min xwest ku bêm zanîn min tecelî kir." Di hedîseke dî ya sehîh de hatiye: (إن الله جميل يحيب الجمال) Wate "Xwedê hej ji zatê xwe dikir û diviya ciwaniya wî diyar bibûya, loma li dûv wênê xwe yê ciwan tecelî kir" (Elxirab, 1983: 14). Xweda hem aşiq û meşoq bûye û di heman demê de eşq e jî. Loma jî di tesewifê de bi tenê eşq ji bo Xweda ye. Li gorî mitesewifan eşq dabeşî du cureyan dibe:

1- Eşqa Heqîqî: Mebest pê eşqa Xwedê ye û sîfetê yekê yê vê Eşqê viyan e bo Xwedê, mirov bi rêka eşqa Xwedayî digihe keyfxweşiyeke ezelî (Şîmil, 1379: 542).

2- Eşqa Mecazî: Li gorî mitesewifan eşqa mecazî jî giring e û ji bo gihîştina eşqa îlahî weke pirekê ye. Ji ber ku Şêxê Senan ev tecelî dîtibû, bûbû evîndarê keça mesîhî. Lê li gorî mitesewifan divê mirov di vê qonaxê de zêde nemîne. Lewra ev yek hin metirsiyan bi xwe re tîne û insanan dike esîrê nefsê (Adak, 2015: 129).

Şairên Mitesewif ên kurd di berhemên xwe yên edebî de gelek mifa ji berhemên folklorîk yên eşqê standiye, wek *Memê Alan*, *Leyla û Mecnun*, *Ferhad û Şîrîn* , *Şêxê Senan* hwd di edeba kurdî de ev çend gelek dihê dîtin weke Ehmedê Xanî şakara xwe *Mem û Zîn* ji berhema folklorîk Memê Alan sitandiye. Rast e ev eşqa van berhemên folklorîk di rastiya xwe de eşqeke mecazî ye, lê di dawîyê de ew eşq ber bi eşqa îlahî ve diçe wek çawa Mecnûn di dawî de dibêje heger Xweda neba Leyla jî nedibû, bi watayeke felsefî heger Leyla weha ciwan be û cihê xwe di dilê Mecnûnî de kiribe, ma eşqa Xwedê ku eşqa heqîqî ye ka ciwanî û radeyê wî çend e. Di nav berhemên edeba klasîk a kurdî de eşqê cihekî berfireh girtiye û nûnerê wê yê herî giring Melayê Cizîrî, Nalî, Pertew Begê Hekarî, Kurdî, Salim hwd in. Bi piranî eşq di xezelan de dihê dîtin. Dîsan mesnewî jî li ser temaya eşqê hatine afirandin wekî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Leyla û Mecnûna* Sewadî hwd.

**5. Eşq Di Dîwana Melayê Cizîrî De**

Melayê Cizirî nûnerê herî giring yê eşqê dihê naskirin. Dema mirov dîwana wî bi tevayî dixwîne ev tişt bo mirovî baş xuya dibe. Mela evîndarê eşqeke ruhanî bû û eşqa Xwedê mebesta sereke ye li cem wî, ji ber ku ew mirovekî sofî bû û wataya eşqê li cem sofîyan eşqa Xwedê ye û ev eşq jî bi eşqa heqîqî li cem sofiyan nasyar e. Ji ber ku eşqa mecazî ku eşqek cismanî û şehwanî ye, metirsiyan bi xwe re diîne, mirovî dike esîrê nefsê û xweşiyên dinyayê, her ji ber vê yekê Mela spasiya Xwedê dike ku ew nekiriye aşiqekî mecaz û evîndarê xweşî û malê dinyayê dema dibêje:

Minnet ji Xwedayê ku bi ‘ebdê xwe melayî
Êksîrê Xemê Îşqê – ne dînar û derim – da (Cizîrî: 2005: 33)



Wata Cizîrî dibêje spas ji bo Xwedê çi milk û malê dinyayê nedaye min, ji ber ku eşqa şehwet û xweşiyên dinyayê eşqeke mecazî ye û çi rastî bo wê nîne û mirov di wê bazirganiyê de her dem li xisarê ye. Lê Xweda ji ber ku afrênerê her tiştî ye, eşqa wî ji her tiştekî din mezintir e û mirov bi wê eşqê digehe aramiyeke derûnî. Dîsa “eşq weku toxmekê xwedayî, bûye behra melayî, ne dînar û derhem ku qirêja dinyayê ne û hîç buha û pîrozîyek nîne- toxmekê mirovanî û madî ne” (Omer, 2017:65). Mebesta sereke ya Cizîrî ew e ku yên xwedanê vê eşqa Xwedayî bin, kesên Xwedayî ne, ji ber ku eşq û ciwanî li cem Cizîrî sifetên Xwedayî ne û toxmek in ji Xwedê, lê yên xwedî eşqek dinyayî bin çi buhayek nîne û mirovî ber bi meydaneke vala ve dibe. Her çend ev eşqa Xwedayî ji bo Cizîrî barekî giran e û ne tiştekî bi sanahî ye mirov hemû xweşî û şehwetên dinyayê bide aliyekî, lê her Cizîrî bi vê eşqê û barê xwe yê giran razî ye û minetdarê hebîbê xwe ye ji bo vê nîmetê. “Ji ber ku aşiqê dinyayê yê kêm e û bêast e û hejar e, eve jî îşaret e bo fermoda pêxemberî ya ku dibêje: Teis ebid eldînar we elderhem we elqitîfe” (Doskî, 2007: 42).

Eşq di dîwana Melayê Cizîrî de bi rengên cuda cuda derdikeve holê, em ê jî di vê xebata xwe de vê mijarê li ser çend binbeşan parve bikin:

### 5.1. Eşqa Heqîqî (Eşqa Îlahî)

Mirov dikare bê arîşe bibêje ku bi tenê eşqek di dilê Melayê Cizîrî de heye ew jî eşqa heqîqî ye. Ji ber ku Mela sofî bû vê çendê gelek kartêkirina xwe li ser wî hiştiye, lê em dikarin bibêjin eşqa Cizîrî eşqek cuda ye û ew rûyê yara xwe di her tiştî de dibîne. Ji ber ku bi eşqê Cizîrî digihîje pileya herî bilind ya ruhî û eşq dibe rênuma û murşîd û pîr ji bo Cizîrî, lewma di bin rohniya pîratiya eşqê de tu cudahî di navbera ayîn û mezheban de namîne. Wate seydayê Cizîrî mezheb û ayinê eşqê bingeha her mezheb û dînan dizane. Mebesta sereke ya eşqê li cem Cizîrî bi tenê eşqa Xwedê ye û bi rêka Wehdet Elwicudê eşqa xwe bo Xwedayê xwe diyar kiriye û gotiye bi tenê eşqek heye ew jî eşqa Xwedê ye û dibêje divê her mirovek û her olek berîya her tiştî eşqa xwedê di dilê wan de hebe. Lê di rêya wan her tiştî da, bi tenê eşqa Xwedê mebest e weke dibêje:

Dil yeke dê ʻişq-i yek bit ʻaşiqan yek yar-i bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildar-i bes
Min di benda zulfekî dil da bi destê pîrê ʻişq
Lew di ʻişqê da ku best ihram û yek zunnar-i bes
Terh û terz-i bûne zunnar û çelîpa yek bi yek
Lew mi zinnar û çelîpa yek tinê yekcar-i bes
Hin ji nik dêrê ve tên qesta keniştê hin dikin
Ney ji van im ney ji wan im min derê xemmar-i bes (Cizîrî, 2005: 163)

Cizîrî di vê şiîra xwe de mîna peyamberekî bangewaziya tek (yek) eşqiyê dike û li gorî wî ne giring e tu çi ol bî, çunkî her olek rêyek e bo nasîna Xwedê, lê ya giring ew e her mirovek xwedî eşqeke heqîqî be, çunkî aşiqên rast û dirust bi tenê eşqek bo wan bes e. "Cizîrî bixwe jî ev bawerî bi cih înaye, ji ber ku li ser rêbaza Îsa Pêxember (silav lê bin) bûye û Elhib Elensa nekiriye û bê jin miriye" (Doskî, 2007: 536). *Zunnar* û *Çelîpa* ya yekem kemerbenda Rebenên dêrê ye û ya duyem formê biçûk ê wê darê ye ku hezretê Îsa pê ve hatiye mîxkirin. Ev amajeyên ola Xiristiyaniyê sîmbolên wê yekê ne ku Xiristiyanî olê evînê ye û dîsan felsefeya dînê wan li ser evînê radiweste. Bi vê çendê olê Xiristiyaniyê nêzî sofîgeriyê dibe, her ji ber vê yekê Cizîrî gewherê eşqa xwe ya heqîqî di formê *Zunnar* û *Çelîpa* de berceste kirine û bes in ku derbirînê ji yek-eşqiya wî bikin. Anku Cizîrî ji dinyayê û axîretê bi tenê yek eşq hilbijartiye, ew jî eşqa Xwedê ye. 

Cizîrî li kinar tefsîra xwe ya irfanî ji bo eşqê, bi tefsîrek û nêrînek felsefî jî nêriye pirsa eşqê û her bizvînek li cem wî eşq e, wate tenê çerxa stêran û felekê jî hemû eşq e ber bi kamilanê, her wiha hebûn jî hemû eşq e, avabûna cîhanê jî ji eşqê ye, ji esmanan bigre heta masiyê binê deryayê.

Bi eşqê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têk-i bi mihrê ji sema ta bi semek (Cizîrî: 2005: 204)

Cizîrî ne tenê mirovan bi eşqa Xwedê dide binavkirin belkî hemû kaînên din jî weke melek, çerx û felek, erd û asiman ta digihe masiyên di binê behrê de tim dimestin û di livînê de ne û bi nûra hebîbê xwe ron û geş dibin. Ev ilim û îradeyên xwedayî yên nepen

bi ronahiyê diyar dibin û ev jî felsefa sofîsizmê ye. Ev jî dîdgehek felsefî ye ji bo mijara hebûnê li cem Melayî, ji ber ku li cem Melayî her bizav û livîneke di dinyayê de ji sedema hêza eşqê dilivin û digehin hev û çavkaniya sereka ya vê eşqê, Xweda bixwe ye û ev hemî hebûn di eşqa hebîbê xwe de tim dimestin û di livînê de ne. Mirov dikare bêje ev dîdgehên Cizîrî mîna dupatî yan jî timamiyekê ne ji bo teoriyên felsefî yên yewnan sebaretî mijara hebûnê.

Gelek caran Cizîrî ciwaniya Xwedayê xwe di qalibên matiryalî de dişubhîne, dema dibêje:

Min dî seher şahê mecer libsê di ber mexmûr bû
Ew dêm zerî surr muşterî yareb perî ya hûr bû (Cizîrî, 2005: 289).

Li vê derê Cizîrî saloxdana 'eşqa xwe ya xwedayî di qalib û peykerekî matiryalî yê keçeke ciwan de dişubhîne û li vê derê şairî wêneyê endamên leşê dilbera xwe ji siruştê distîne. Ji bo ciwaniyê û li hember hev berawird dike. Anku jêderê her ciwaniyekê ji xweşikbûna Xwedê ye, her çend mebesta sereke ya şairî ji vê şiîrê eşqa dildarî ya asmanî ye (heqîqî), lê "hindek caran heger bo rohnkirinê jî be ew dildarî di wî peykerî ra dihê dîtin. Wate giyan dikeve di qalibekî madî de, mebest jî ji vê çendê hesta giyanî ye, belê dikete hestek matiryalî ku bi çav dihêt dîtin. Mebesta şairî ji vê çendê ew e diyardeyên madî bo diyardeyên giyanî bi kar biîne" (Xeznedar, 2010: 302). Ku wate heger çi pûtperês (senem) bizanin jî Xwedayê wan çi hêza livînê nebe jî, lê ew nûr û hebûna Xwedayê xwe di wî peykerê madî re dibînin, anku ew made hêmanek e bo hebûna hêzeke din ya mêtafîzîk ya veşartî li cem wan, her ji ber vê çendê ev yek weke kevneşopiyekê lê hatiye li cem şairên klasîk yên kurd û bi taybetî li cem Cizîrî. Gelek caran Cizîrî nûr, dêm û xweşikbûna eşqa xwe ya heqîqî di qalib û peykerekî metiryalî de şubhandiye weke remzek û beşek ji sîfetên Xwedê. Çunkî xweşikiya insanan tecelliya navê cemal yê Xwedê ye. Ji ber ku Şêxê Senanî ev tecellî dîtibû bûbû evîndarê keça mesîhî.

Li cem Cizîrî melbendê eşqê dil e, anku dil qilegeha Cizîrî ye û melbendê eşqa wî ya heqîqî ye, her ji ber vê çendê ew dibêje:

Mehbûb di dil bit me bi evraz çi hacet
Enqa bi xwe bîtin fir û perwaz çi hacet (Cizîrî, 2005: 93)

Ev hizrek sofîgerî ye û wê watayê dide, eger mirov gehişte armanca xwe, hewce nake mirov biçe li esmanan li wî tiştî bigere wekî wî balindê (Sîmerx - Enqa) efsûnî ka dê bi dest mirovî keve yan. Bilindahî jî remzek e bo renc û îbadetê wekî nimêj, rojî, dia û taet. Anku Cizîrî dixwaze bêje eger mirov gehişte pileya baweriyê (nemana gumanê – yeqîn) wî çaxî hewceyî îbadetê nake û tiştek zêde ye. Çunkî "bahra pitir ji qutbên sofiyan li dîf wê baweriyê ne îbadet piştî peydabûna yeqînê ya zêde ye û hindeka ji wan gazinde ya ji pêxemberan kirî ku wan rêka xwedê ya dirêj kirî, yan ya bi zehmet kirî" (Doskî, 2007: 256).

**5.2. Xweda û Teceliya Zatê Xwe (Eşq Teceliyê)**

Wek diyar e yek ji qonaxên afirandinê eşq e û mitesewif bo wê çendê diçin ku Xwedê ji xweşikbûna zatê xwe tecelî kiriye, anku piştbest in bi hedîsa sehîh a cenabê pêxember: "Ez xezîneyeke veşartî bûm min xwest ku bêm zanîn min tecelî kir." Cizîrî jî weke şairekî sofî, ev çend di şiîrên wî da dihê dîtin:

Hê di ber (qalo: bela) yê belku ev aleme nebû
Çerxê dewran dewrê gerdûn gunbedê mina nebû
'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû istiwayê lami'a 'işqê hebû
Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq-i yek bûn şem' û hem perwane bû (Cizîrî: 2005: 296)

Beriya Xwedê teceliyê bike ew kenzek veşartî bû, lê wî xwest bêt zanîn û Xwedê ji xweşikbûna xwe tecelî kiriye û ew aşqê zatê xwe bû. Wate Xweda hem aşiq û meşoq bûye û di heman demê de eşq e jî. Anku beriya qonaxa afirandinê ciwanî û eşq her hebûn. Li gor nerîna Cizîrî her organîzmek gerdunî ji viyana Xwedê hatiye afirandin anku Xwedê li berahiyê viyaye paşî çê kiriye, mirov jî mînaka herî berçav e di vê bazineya eşqê de, madem ku mirov tovê eşqê ye bi eşqê dimîne û zindî dibe, bo nimune, mirov ji jiyanê hez dike ji ber hindê heye, anku peywendiya mirovî bi jiyanê ve peywendiyeke aşiqane ye. Di qesîdeya "Ellah Sehergaha Ezel" de Cizîrî behsa qonaxên afirandina gerdûnî dike:



Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemal a lem yezel zatê tecella ya xwe da
Zatê tecella bû li zat bê ism û asar û sifat
Sirra hurûfên 'aliyat xef bû di sitr û perde da
Zatê muqeddes bû wucûd coşiş neda bû behrê cûd
Wesf û izafat û quyûd yek jî tecellayê neda
Husn û cemalê xwest evîn vêk ra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan lêk-i naz û 'işwe da (Cizîrî: 2005: 51)

Di ezelê de Xweda yê tek û bi tenê ye, çi tiştekî dî tuneye. Weke wî çiraxê ji çiraxê hildibe, Xwedayî eşqî û ciwanî dane tiştan û made bi ciwanî û eşqa xwe zindî kirin. Anku beriya Xweda afirandinê bike, made hebûye û ji wî madeyî heyî afirandin kiriye. Anku dema Xwedayî xwestî hebûn peyda bibe, wî çiraxê eşqê hilkir, çunkî ew gencîneyeke veşartî bû û xwest bihêt zanîn û wî tecelî kir.

Piştî ciwanî û eşq ji Xwedê bo mirovan mayî jiyanê dest pê kir û li dûv nêrîna Cizîrî ya ku ji hêla Fazil Omerî ve hatiye şêwirandin, ew ciwaniyê bi eşqê ve girê dide, anku li gor nêrîna Cizîrî heger ciwanî nebe eşq peyda nabe, ji ber ku ciwanî di keresteyan de ye û pêdivî bi dîtinê ye da ku nirxek hebe û hest bi ciwaniyê bihê kirin. Ciwaniya nehêt dîtin û ecibandin, ciwaniyeke kêm û lawaz e. Anku eşq û ciwanî du saxletên Xwedayî ne û beriya afirandinê her hebûn. Ciwanî û eşq li cîhana Xwedayî tek û tenha pêkve digel yek bûn. Lew ev her du saxletên Xweda bixwe bû û pêkve pêdivî çi tiştê dî nebû. Em dikarîn bibêjin

ku ji berî ezelê evînî li feleka ciwaniyê dizivirî û her du pêk ve sermed bûn (Omer, 2017: 60). Bi rengekî giştî Cizîrî xwestiye bibêje ku Xwedê mirov û hebûn bi tevayî ji ciwanî û eşqê afirandiye. Ji ber hindê jî Cizîrî weke yek ji şairên kurd bi hizra xwe ya sofîyane gewherê her tiştî ciwanî û eşq e. Ciwanî dibe sedema peydabûna eşqê û her tiştekî ne ciwan be eşq jî dernakeve holê, anku her tiştê ciwan be divê mirov hez jê bike.

**5. 3. Ûnsirê Pêncan**

Her ji serdema Yewnana Antîk ve gengeşeyeke tund derbarê hebûn û afirandina gerdûnê de hebûye. Ev diyalêktîk hîn jî berdewam e û dem bo demê nêrînên derbarê hebûnê de dihêne guhertin. Lê her teoriyeke nû bihête kifşkirin amaje bi dîtinên destpêkî yên derbarê hebûnê de dihêne kirin. Ji ber hindê jî berî ku nêrîna Melayê Cizîrî bidin derpêşkirin gerek e em bi kurtî nêrînên fîlozofên yewnanî yên destpêkî bidin diyarkirin.

Thales (546-627 BZ) wek yekem fîlozofê yewnanî dihê hejmartin ku nêrîna wî derbarê hebûnê de di fîlozofiyê de gelekî pêşçav e, li gor gotina Aristotleî Thales av bi havênê hemû tiştan daniye, anku hemû tişt ji avê ne. Vê nêrînê heya nuha giringiyek heye di jiyana mirovan de, heger çend ji rastiyê dûr be ew qas nêzîk e jî. Her weke mirovan li destpêkê gund, bajar û şaristanî li ber çeman ava kiriye, lê ev bo hebûnê têrê nake.

Fîlozofê duyem yê Yewnanî Anaximandre (547-610 BZ)e û hebûn li cem evî fîlozofî made ye, li gor nerîna wî hebûn neşêt bo madeyekê bi tenê bizivire, belku ji gelek madeyên din pêk dihê û digel hev diguncin heger çend dijhev bin jî weke germî û sarî, hişkatî û teratî ku evên han di destpêkê de yek tişt bû û piştre ji hev cuda bûn, ew tiştê ku vê valahiya di navbera du madeyan de wekî agir û av tijî dike, hebûn e û ji vê çendê re jî dibêjin guncandin (Sedîq, 2015: 27-28). 

Anacsimenes (546-528/523) hewayê dike bingehê hebûnê û ew weke Sifreyekê ye û hewayê hemû derdora wê girtiye. Lê Heraclite (475/478-544/540) di wê baweriyê de ye agir havênê hemû madeyan e û cîhan berdewam agirekî sax û nemir e û agir bingeh û resenatiya her tiştî ye û hemû tişt ji agirî derdikevin û her bo agirî dizivirin (Sedîq, 2015: 34-35). Ev her çar ûnsir (av, made, hewa û agir) weke çar toxmên sereke û herî berbelav ên hebûnê di nav meydana felsefî û sofîgerî de dihêne pejirandin. Ev nêrîn jî di şiîra Cizîrî de ketiye ber nîqaş û gengeşeyê:

Çar ʻunsur in çar teb'et in vêkra bi mîzan vêk ketin
Bi hev ra muxalif sîret in der sûretê şexiyye da
Hetta bi mîzan çar esil bi hevra nebin cem' û wesil
Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda
Çar ummehat in sê benat her bê qerar in bê tebat
Pur ʻişq û meyl in iltifat di vê teze deyrê kuhne da (Cizîrî: 2005: 66)

Heta ku her çar ûnsir bi pîvan negehin hev candar jê peyda nabin. Anku her hebûnek (kain) ji van tuxman dirust bûye, belê gerek ev tuxm bi pîvan û terzî (mîzan) bigehin hev, heta afrênerên curbicur jê peyda bibin. Xwedê ji van çar ûnsiran hebûn

çêkiriye û ciwanî û eşqa xwe jî tê kiriye. Eger em bi awayekî felsefî li vê nêrîna Cizîrî mêze bikîn, dîtina wî mîna fîlozofê yewnanî Platoyî ya mînakî ye, ji ber ku beriya hebûnê (afrandinê), zatê Xwedê, made (çar ûnsir), ciwanî û eşq her hebûn û Xwedê ji van madeyan afirandin kiriye, anku ev cîhan û hebûna em nuha di nav de li ber cîhana dî ya resen û mînakî hatiye çêkirin, bi vê yekê her tiştek wêneyê xwe ji cîhana bilind û Xwedayî distîne. Ev hebûna madî ya berhest sîbera cîhana Xwedayî ne. Bo nimûne di her hebûnekê de ciwanî û eşq hene û ew gewherê hebûna wan in û ew herdu du sîfet û tuxmin ji Xwedê û Xwedayî ji wan tuxmên xwe jîn daye hebûnan û ew zindî kirine. Bi vê yekê mirov li ber sîfetên Xwedê û têkelkirina madeyan dirust bûye û jiyana me ya nuha sîbera cîhana Xwedayî ye. Ev jî nêrîneke felsefî ye ji bo mijara hebûnê pitir ji nerîneke dînî.

Ev vedîtina mijara hebûnê di şiîra Cizîrî de vedigere ji bo kartêkirina felsefa yewnanî li ser wî û diyar dibe ku Cizîrî gelek haydarî felesefe û merîfeya yewnanî bû, ji ber ku di dîwana wî de gelek zaravên felsefî yên yewnanî hene û ev zaniyarî jî ji wan pertûkan hatine standin yên ji bo zimanê erebî yan farisî hatine wergêran, çi bi rêka şiîrê yan wergêranê be. Bi vê yekê wî jî xwestiye vê mijara giring li gorî dîdgeha xwe ya felsefî û arifane bide rohnkirin. Ji ber ku Cizîrî pêçewaneyî sofîger, arif, şair û fîlozofên beriya xwe nêriye hebûn û kewnî behs kiriye. Cizîrî bi nêrîna xwe ya felsefî û sofîgerî regezek din li ser regezên afrandinê zêde kiriye, ew jî regezê pêncan e “Eşq” e ji bo wan regezên din yên sereke wekî av, ax, agir û hewa (Mihemed, 2006: 93). Wate eşq ew hêz e ku van ûnsiran dirust dike, dema dibêje:

Me cewher ‘unsurik xamis numa îro di tali’ da  
Di vê teqwîmê insanî li tali’ bûne fal ebrû (Cizîrî: 2005: 287) 

Yan jî:

Husnê hub anî zihûrê ‘işqê eslê ‘alemê  
Eslê eşya da bizanî wan çî esl û made bû (Cizîrî: 2005: 296)

Di felsefeya fîlozofê yewnanî Empedoclesî de ku hemî tişt ji pêkhatina çar ûnsirên (ax, av, agir û ba) pêk dihên û Cudabûna wan ji hev li ser rêjeya wan radiweste. Belê derbarê wê hêza karîger a ku wan ûnsiran digehîne hev û tişt jê dihên afrandin, dibêje: “Ev ûnsir hevdu bi hêza jêkvebûn û pêkvebûnê digirin û ev herdu jî hevdij in û ji yek hêzê çênabin û pêdivî du hêzan e yek verevîne û ya din jî rakêşane (cezib) ku ev jî dibin neviyan û viyan”. Piştre dibêje: “Di binyat de ev çar ûnsir yek bûn belê neviyanê ew ji hev cuda kirin. Belê başî viyanê hêza xwe kom vekir û hemî gehandin hev û piştre tiş jê çêbûn” (El-Doskî, 2010: 27).

Wate eşq eslê dinyayê ye û ew ûnsirê sereke û nûranîye yê van hemû kaînan bi hevdu ve girê dide. Li gor nêrîna Cizîrî tiştê ku van her çar ûnsiran digehîne hev û digel hev biguncîne eşq e ev jî nêzîkî nêrîna fîlozofê yewnanî Empedocles e. Anku eşq ew hêza karîger e ya ku bikaribe ûnsirên ji hev cuda bigehîne hev. Wate ew çar ûnsirên sereke bi rêka eşqê digehin hev û kaîn jê dirust dibin. Weke diyar e ev çend we dike ku mirov dikare bibêje Cizîrî xwestiye mijara hebûnê bi awayekî felsefî behs bike, belê “felsefeya

Empedoclesî rolî nade Xwedê di çêkirin û afrandina tiştan de, Cizîrî bi vê ramanê serederiyê digel babetî nake, çunkî ew misilman e" (Doskî, 2007, 1097). Wekî Cizîrî dibêje: "Îro di bextê me de diyar bû ku laşê me mirovan ne tenê ji çar ûnsiran pêk hatiye, belku ûnsirekî dî jî di gel e, ew jî ûnsirê pêncan e, Eşq e". Ji ber ku zatê Xwedê bi xwe dibêje mirovan: "Min hûn bi baştrîn şêwe çêkirine." Ji ber ku Xwedê saloxetên xwe yên evîn û ciwaniyê di gewherê mirovan de danaye. Bi vê yekê diyar dibe ku gewherê mirovan ji pênc ûnsiran pêk dihê, ew jî ax, av, hewa, agir û eşq in ku eve jî dibe nerîneka din. Ji ber ku Cizîrî misliman e wî di felsefeya xwe ya hebûnê da pêçewanî nerîn Empedoclesî rolê sereke daye Xwedê, ku ew jêder û gewherê sereke yê hebûnê ye û bê sîfetên wî ev ûnsir nagehin hev û hosan afrandin çênabe, belê ji ber ku Xwedê weke xezîneyeke veşartî bû û ew aşiqê zatê xwe bû û hem eşq bû jî, lê wî xwest bihêt zanîn, bi vê yekê wî ji madeya û sîfetên xwe tecelî kir da ku xweşikî, eşq û bihayê wî bihê zanîn:

Gerçi bilbul cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'işqa bilbul e
Guh de zikrê hal û coşa badeyê
We bi bilbul ra dixwînit bilbule (Cizîrî: 2005: 279)

Mebest di vê şiîrê de, bilbil mirov e û gul şubihandinek e bo Xwedê, wate mebesta Cizîrî mirov hêma ye bo hebûna Xwedê, anku buhayê gulê di eşqa bilbilî de xuya dibe. Ger bilbil neba gulê jî çi bihayê xwe nedibû. Anku "hemî huner û gewhera bilbilî di gulê de ye û eger gul ciwan neba bilbil nedibû evîndarê wê, ew sitran û awazên dibêje bi saya gulê ne, belê di heman demê jî de bihayê gulê jî ji eşqa bilbilî daye. Eger wî wesan bi gulê negotiba navê gulê weha navbang nedibû. Anku pêdivî ye dilber û dildar her du spasdarên eşqê bin ku ew kirin yek û bê hevdu çi buhayekî wan nîne" (Mûkriyanî, 2014: 550). Anku Cizîrî gewhera her tiştî di dinyayê de bi eşqê ve girê daye û eger eşq nebe dê dunya mîna meydaneke vala û bêbuha be. Her ji ber vê yekê xwedê tecla kir û ciwanî û eşqa xwe da mirovan da ku mirov bi wan sîfetan hez ji Xwedê bikin û biha û qîmeta wî bizanin: 

Ger bidiya ew senema sur cemîl
Nazlî erzan nedibû cibreîl!
Min nezerek husn û cemala te kir
Aînîyek dî me ji nûra celîl (Cizîrî: 2005: 211)

Anku ciwanî û eşq li cem Cizîrî mîna siroşekê ne li erdê, eger mirov vê ciwaniyê bibîne, pêdivî bi çi wehî û Cibrîlan nake nazil bibine erdê. Çunke eşq li cem Cizîrî mezheb e û divê mirov li gorî vî mezhebî bijî. Anku eger mirov raz û remaza ciwanî û eşqê bibîne pêdivî bi çi ol û mezhebên dî nake. Çunkî ew bixwe mezhebekî rast û dirust e ji bo jiyana me. Bi vê yekê li cem Cizîrî ciwanî û eşq cihê wehiyê digirin li erdê û ev jî nerîneke sofîyane ye li cem wî. Ji ber ku Xwedê mirov bi baştirîn endazeyê saz kiriye û her tiştek nîşanî wî daye. Bi vê yekê eger mirov wan raz û remzên Xwedê bibîne pêdivî çi olên dî nake li erdê.

Bi vê yekê jî diyar dibe ku şiîr li dev Cizîrî ne tenê aliyekî estatîkî, rewanbêjî û wijdanî ye. Belku şiîr ji bo wî mîna penageheke felsefî, sofîgerî, dînî, lojîkî û îrfanî ye derbarê pirsên hebûn, Xweda, ol û kewnî û hwd çi ev nerîn timam kirinek be li ser teoriyên beriya xwe yan jî dîtineke nû be li ser wan. Ji ber ku ya diyar e Cizîrî li gelek mijaran bûye xwedan û bi nêrînên xwe ew tişt xistine jêr guman, pirs û diyalogan.

**5.4. Eşqa Mecazî**

Ev cure eşq gelek di nav wêjeya kurdî ya kalsîk de dihê dîtin. Ev mijar ji hêla şairên kurd ve bi du rengan derdikeve pêşberî me, di dîwanan de û bi taybetî di xezelan de cihekî giring girtiye. Dîsa di mesnewîyan jî de ev mijar gelek giring e, ji ber ku hindek menzûme ji serî ta dawiyê li ser vê mijarê ava bûne, weke *Mem û Zîn*, *Ferhad û Şirîn*, *Leyla û Mecnûn* û *Yusif û Zûleyxa* û hwd. Lê dibe ev çîrokên evîniyê hindek mebestên din bi xwe ve bigirin, weke "*Mem û Zîn* netewî ye, *Leyla û Mecnûn* Islamî ye û *Yusif û Zûleyxa* gerdûnî ye" (Adak, 2015: 132). Ev jî bo şairan dibe behaneyek ji bo derbirîn ji hindek mijarên din yên felsefî, netewî, civakî û olî. Weke çawan Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de weha dibêje:

Şerha xema dil bikim Fesane
Zînê û Memê bikim behane (Xanî, 2004: 56)

Ehmedê Xanî ji vê çîroka folklorîk ya devrê sûd werdigire, da ku derd û xema miletê xwe pê nîşan bide û ev çîroka eşqê ji bo Xanî dibe behane ji bo mebesteke netewî. Her ji ber vê yekê ev çîrokên dildariyê di nav dîwana Cizîrî de, bi gelek mînakên çîrokên kurdî û rojhilatî dikevine pêşberî me. Anku Melayê Cizîrî hindek caran eşqa mecazî jî di helbesta xwe de bi kar înaye. Lê her mebesta wî jî ji vê çendê eşqa Xwedê ye û ramaneke sofîgerî dide. Wekî eşqa bilbilî ji bo gulê yan mifa wergirtin ji hindek çirokên folklorîk wek Leyla û Mecnun û Ferhad û Şirîn û hwd ku di van çîrokan de jî nûr û eşqa Xwedê mebest e û bi rêka eşqa mecazî digehin eşqeke heqîqî. Ji ber ku bi nezera mitesewifan eşqa mecazî weke pirekê ye ji bo gihiştina eşqa heqîqî, weke Cizîrî dibêje: 

Mey nenoşî Şêxê Sen'anî xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet
Mislê Mûsa wî tecallayê dî
Ê tu dî kanî xelet hanê xelet (Cizîrî, 2005: 184).

Cizîrî di vê qesîdeyê de awirekê dide ser serhatiya dildariya Şêxê Senan, ku ev jî yek ji vegotinên evîndarî yên edebîyata netewên rojhilata navîn e û vê vegotinê di nav edeba van milletan de karîgeriyeke mezin kiriye û kevintirîn berhemên edebî ji wê çîrokê *Mentiq û Teyr*a şairê faris Etarê Nîşabûrî ye û vê çîrokê bandora xwe li Cizîrî jî kiriye û wî jî nêrîna xwe li ser vê mijara eşqê daye, ku bi dîtina wî ya sofîgerî Şêxê Senan yê xelet nebû dînê xwe hêlayî û bi dûv keçeke mesîhî ketî, ji ber ku Şêxî nûra Xwedayê xwe di dêmê keça mesîhî de dîtibû lew ew bû evîndarê wê. Anku bi nêrîneke sofîgerî Cizîrî dixwaze bibêje mebesta sereke ya Şêxê Senan eşqa xwedê ye û ji bo wê eşqê Şêxî mal, milk û dînê xwe hêla û çû welatê mesîhîyan ji bona eşqa xwe. "Çawa be, Xwedê bi xwe jêderê ciwaniyê ye, lew ciwanî elementeke bihadare û pîroze li erdê û nûnertiya wî dike wek dergeh, wek

rêk" (Omer, 2004:55-56). Ku wate li gorî mezheba eşqê ya ku Cizîrî afrandî, Şêxê Senan di wê rastiyê gihiştiye ya ku Cizîrî dibêje eger mirov raz û remza ciwaniya eşqê di dêmê mirovan de bibîne pêdivî çi ol û mezheban nake, her ji ber vê yekê cizîrî giliyê mirov û heta ezazîlî jî dike ku wî ew raz di dêmê Ademî de nedît eger da sucdê bû bet: "ger ezazîlî bidîta ne dibir xeyrî sicudê" anku li vir Şêxê Senanî dirûvê Xwedê di keça Ermen da dîtibû, lew ew bû aşiqê wê:

Tine Ferhaf dizanit lezetê eşq
Ku wî can da ye şirînê ne Perwîz (Cizîrî, 2005: 151).

Bi tenê Ferhad ramana eşqê dizane, ji bo dîtîna eşqa xwe û tamkirina dîtina wê eşqê çiyayê *Bêston* kun kir. Belku eşqa Ferhadî bû Şirînê eşqek canî bû ne weke eşqa şah Perwîzî eşqek leşî ya xweşiyan bû. Ev mijar li cem sofîyan ramaneke din heye, ew ramana û wateya eşqê di ruxsarî de dibînin, belê dema eşq gehişte pileya peywendiya leşî wê demê eşq namîne û dimire. Cizîrî bi xwe jî peyrewê vê destûrê ye.

Lê li goreyî sofiyan eşqa mecazî weke pirekê ye ji bo gehiştin ji bo eşqa heqîqî, belê divê mirov gelek di vê qonaxa eşqa mecazî de nemîne, çunkî mirovî dibin helakê û Cizîrî bi xwe jî dibêje:

Hubbê cismanî du roj in gerçi dil pir pê disojin
Xef ceger peykan dinojin mislê neqşê bêbeqa ye (Cizîrî, 2005: 263).



Li gorî Cizîrî eşqa cismanî ew eşq e ku zû bi dawî dihê û çi tam û çêj tê da nîne û weke neqşek bê biha ye û zû jê diçe û bi tenê dilê mirovî diêşîne û mirovî dike êxsîrê nefsê. Heger çi qas çîrokên dildarî di dîwana Cizîrî de hebin jî lê mebest ji wan jî bi tenê yek tişt e û Cizîrî bi xwe jî wê çendê rohn dike:

Wellah ji herdû 'aleman min husnê canan e xerez
Lew min ji husna dilberan her sun'ê rehman e xerez (Cizîrî: 2005: 177)

Bi watayeke giştî Mela evîndarê ciwaniyê ye û ji ciwaniyê jî ciwaniya ruhî ye. Ku ev ciwanî ya han jî ji nûr û cemala Xwedê bi xwe ye. Li cihê din Melayê Cizîrî ew eşqa di navbera gul û bilbilî de dike mînak ji bo eşqeke mecazî û weke mijarek felsefî derbarê hebûnê de vê pirsê dixe jêr niqaşê, ew jî dema dibêje:

Gerçi bilbil cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'işqa bilbul e

Guh de zikrê hal û coşa badeyê
We bi bilbul ra dixwînit bilbule

Sosinan sed rengî avêhtin kemend
Wan nego dil bendê tayek sinbul e

Sinbulan seywan li dêmê taze kir
A fitab îro di burca sinbul e (Cizîrî: 2005: 279)

Dihê zanîn ku Cizîrî bi hunera xwe ya mezin di yek haletî de yanî li gorî dêre hozana jorî di sê goşe (zawiyan) de wate di zawiya eqlanî, îrfanî û lojîkî tefsîra hebûnê dike. Ya yekem ew e ku dibêje heger çi wicud mîna bilbilê aşiq e û Xweda jî mîna gulê meşuq e ku weke tefsîreke îrfanî ye, lê li gorî heman beytê şair weke argumintek eqlanî ye, ew jî dema dibêje: Rewneqa gulê jî girêdayî bi bilbil re ye, çunkî heger eşqa bilbil nebe, çawa hebûna rewneq ya gulê tê selmandin. Ji aliyekî din bi şubhandina sosinan dîsa diselmîne ku wicud yek e, heger çendî jî bi kesret be mîna sosinan ji ber ku çawa xwe belav dike di yek cih de xwe zêde dike, lê dema lê dinêrî hemû wekhev in, wate her yek e. Ji aliyê din sinbul, ku berovajî sosinan tenê yek gul dide hemû dil dikevin benda yek sinbul, lê ew jî girêdayî bi ronahiya nûrê ye, heger nûr nebe gelo ma çawa ev ciwanî û cemala sosin û sinbul dihête dîtin ku bi afîtabê wate bi rojê dişubhîne ku ev hemû jî tenê bi eşqê tê kirin weke dibêje:

Meinayê eşqê bêm: çiye lew min bi çeşmê dil diye
iksa cemalek safiye lami di mirata meda (Cizîrî: 2005: 52)

Mezinahî û mahrî û hunermendiya Melayê Cizîrî li vir daye, ku li gorî yek dêre şiîr bi sê tefsîran yanî tefsîra felsefî *zahir, eraz, cewher*, tefsîra irfanî *Wehdetulwicud*, tefsîra lojîkî *Lazimumelzum* bi riya eşqê selimandine ji bo hebûnê û hebûna Xwedayî dike, “aliyekî din derbirînên Cizîrî hilgirê raman û tefsîrên gelek kûr in weke dibêje:

Di Işqê şêxê sanîme bi dil behrê meianîme
Di eqlîmê suxen mîrim di eşrê da changîrim (Cizîrî, 2005: 304)

Eve ye ku Cizîrî mîna *Ebu Alî Sîna* , bi Şêxê ewel tê naskirin kariye li kinar tefsîra îrfanî ji bo eşqê tefsîrek felsefî jî bike ku bo cara ewil ev e şêwazê Ebu Alî Sînayî lewra xwe bi Şêxê Sanî dibîne. Cizîrî di eşqê de xwe mîna deryayek ramanên felsefî, îrfanî, terîqetî û nefsanî hwd dibîne xwe bi çaresevan dizane.

**5.5. Agirperestî**

Agir di felsefeya kevin Rojhilatê de, di nav gelên deverê de yên ku girêdayî bi rojperestinê weke sembolek pîroz e. Kirnûşbirin bo roj û heyvê ji ayînê Zerdeştî û Mîtrayî hatiye standin. Agir di ayînê Zerdeştî de gelek hatiye pîrozkirin û gehiştiye radeyê perestinê. Pîroziya agirî ne bes di ayînê Zerdeştiyê de, belku li cem feylosofê yewnanî Heraclite, agir destpêk û bingeha hebûnê ye (Mehmûd, 2014: 96-97). Dîsan “weke dihê zanîn ayîna herî kevin ya Ariyan Agirperistî ye” (Paşa, 2007: 13). Cizîrî jî di şiîrên xwe de pena bo agirî û pîroziya wî biriye, lê ev çend gelek caran bo wî bûye sedema asteng û belayan:

Dibên xawerperest î tu nizanin min di keşfê da
Numayin min di şerqê nazika gerdenşamal ebru (Cizîrî, 2005: 287)

Cizîrî di vê dêra han de dibêje ku her tim xelkî ew bi rojperestinê sûcdar dikir û digotînê tu rojperest î û mîna Zerdeştiyan tim berê te li rojê ye. Bi karînana navê agirî di helbesta Melayê Cizîrî de, gelek dihête dîtin û mirov dikare bêje ku Mela sera vê çendê tûşî gelek nexweşî, derdeserî û belayan bûye.

Li cem Cizîrî agir nûr û pîrozî ye û ev pîrozî jî ji çanda Zerdeştiyê stendiye, ji ber ku agir her tiştê pîs û lewitî ji nav dibe û sembol e ji bo paqijiyê û di ola Zerdeştîye de agir hêmaya jinavbirina her tiştekî pîs û xirabkar e. Bi dirêjiya dîrokê mirovan jî gelek mifa ji agirî standiye. Her wesa agir di felsefeyê de jî jêdera hebûnê ye û vê çendê we kiriye ku agir li cem Cizîrî ramana pîroziyê bistîne.

Belê hindek caran agir li cem Cizîrî êş û jan û şubhandine bi derdê xwe yê eşqê yê dijwar, dema dibêje:

Zanim ji ‘işqê dojeh î
Behrek ji narê aseh î
Îro li mahê xergeh î
Teşbîhê seywanî mela
Zanim te kohê Tûr e dil
Lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil
Lew mest û sekran î Mela(Cizîrî, 2005: 49)



Yan jî:

Bi narê furqetê suhtim ji ferq ser heta pêda
Xedenga xevletê nuhtim ji berqa lamia têda
Xedenga furqetê rede dilê ew xevletê lê dit
Dibêjim: wer cebel bit ew bikerbit wê digavê da (Cizîrî, 2005: 41)

Li vê derê Cizîrî ji xema dûrbûna hebîbî di agirê xerîbiyê de ji serî heta pêyan disoje û ew di vê rewşa xerab de dimîne. Ev teşbîha han li cem Cizîrî sembola giraniya derdê wî yê eşqa heqîqî ye, ku ew derd weha giran e heger çiya jî be xwe li ber vî derdî nagira û dê pirtpirt bibe. Dîsa giraniya dûrbûnê mîna wê tîriyê ye ku mîna birîsîyekê bi xafletî bi mirovî dikeve. Her ji ber vê çendê agir li cem Cizîrê ramana sextî û dijwariyê dide. Belê hindek caran agir li cem Cizîrî nûr û ronahiya hebîbî ye, dema dibêje:

Tûr im bi dil û peyrewê Mûsa yim ez
Ateşperes û nûrê tecella yim ez
Me ji narê dî ye nûra te û dil
Lê ji ‘işqa te her ateş peresîn
‘Eynî ‘işqîn û di dil ateşî Tûr
Ji sena berqê cemalê qebesîn (Cizîrî, 2005: 287)

Cizîrî dixwaze mîna Hezretê Mûsa Pêxember nûra Xwedê bibîne û ew şeydayê vê nûrê ye û her ji ber vê nûr û ronahiyê ew bûye agirperest. "Ji agirî jî me nûra xwedê dîtiye her ji ber vê çendê eşqa te di dilê min de wekî Çiyayê Tûrê ye ji agirî" (ew Çiyayê ku hezretê Mûsayî dixwest Xwedê bibîne, lê ji ber dijwarî û giraniya nûra Xwedê çiya nekarî xwe li ber bigire, hindî nûra Xwedê dijwar û mezin bû). Li vê derê mela bi xwe diyar dike ku agir li cem wî nûr û ronahiya eşqa wî ya heqî û bi rengek aşkera diyar dike. Ku wate agir li cem Cizîrî hem nûr û pîrozî ye û hem jî êş û jan e.

**ENCAM**

Li cem Melayê Cizîrî eşq û ciwanî du regez û tuxmên xwedayî ne û ew in jêderên sereke yên hebûnê û her yek timamkera ya din e. Anku eşq jêdera xwe ji ciwaniyê distîne. Dîsa ev mijara han li cem Cizîrî carinan di qalibekî madî de derdikeve holê û carinan bi awayekî menawî (aydiayl) diyar dibe û mebest ji vê çendê jî derbirîn e ji eşqa Xwedê. Ji ber ku Cizîrî ciwaniya Xwedê di her tiştekî de dibîne, çi siruşt be yan jî mirov be. Ev jî gewhera pantayizmê ye. Anku mijara gelek li cem Melayê Cizîrî dihête dîtin eşq e û ji eşqê jî eşqa Xwedê ye. Bi karbirina navê eşq di helbesta Melayê Cizîrî de mebesta xwe ya sereke heye û ew jî ku Melayê Cizîrî gihaye bilintirîn asta irfanê û eşq li cem wî nûr û ronahîya dilan e û jêderê hebûnê ye û her ji ber vê sedemê cizîrî eşqê weke mezhebekê di dilê her mirovekî de dipejirîne. Dîsan eşqa dinyayê û şehwatên cinsî li dev wî dihête teşbîhkirin bi eşqeke sexte û nedirust. Li cem Cizîrî eşq ew hêza karîger e ku di navbera hemû kaînan de kar dike û wan digehîne hev û hebûyên curbicur jê diafrîne.



**ÇAVKANÎ**

**ADAK,** Abdurrahman (2015), *Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De Naverok: Tema, Mijar Û Cureyên Edebî*. Mêrdîn.

**CİZÎRÎ,** Mela (2005), *Dîwana Melayê Cizîrî*. (amd. Tehsîn Ibrahîm Doskî). Çap 2, Duhok: Spêrêz.

**DOSKÎ,** Mihemed Emîn (2007), *Şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî,* Berg 1, Duhok: Spêrêz.

**DOSKÎ,** Mihemed Emîn (2007), *Şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî*, Berg 2, Duhok: Spêrêz.

**DOSKÎ,** Mihemed Emîn (2007), Şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî, Berg 3, Duhok: Spêrêz.

**EDHEM,** Museb (2017), *Îşiqname "Îşiq, Xudbûn, Îşiq berew ew çûn"*, Silêmanî: Rênima.

**ELDOSKÎ,** Muhemed Emîn (2010), *Felsefe Eleşq Elîlahî fî Şir Elcizîrî*. Çap 2, Hewlêr: Elekdîmîye Elkurdîye.

**ELXİRAB**, Mehmud Mehmud (1983), *Elhub û Elmihebe Elîlahiye (Mîne Elkilam Elşêx Elekber Mihyedîn Îbin Elerebî)*. Dîmeşq.

**ESAF,** Fatih, *Elhib Elilahî inde Elsofiye (Hib bila Kirahiye)*, Camie Viladiviye, Ji malperê: https://www.philadelphia.edu.jo/arts/13th/papers/fateh_assaf.doc

**FİLİZ**, Mehmet Şirîn (2015), "*Li ser pênaseya Eşqa Îlahî Çend gotin*", Kovara Nûbihar, J. 132.

**HISÊN**, Doia Efîf Tirkî (2011), *Elhib Fî Ellah Zew Elkitab We Elsine*. Teza Masterê, Camîe Elnecah Elwetenî, Nablis.

**ILWAN**, Ebdulah Nasih, *Elîslam we Elhib*. Dar Elselam.

**ÎZWÎLÎ**, Rizwan Mihemed Sêîd Ecac (2013), *"Elhib Elîlahî we felsefetihî fî Elşir Elsofî: Ebû Medîn Eltilmazî Inmozecen"*. Ekev Akademi Dergisi Yıl: 17 Sayı: 55 Bahar.

**JIYAN**, Rênas (2015), *Wêjeya Kurmancî (Pênûsên Çardehderb).* Diyarbakır: Belkî.

**KABILA,** Anirudha (2014), "*Pharmacological Role of Oxytocin – A Short Review*", Journal of Pharmaceutical Sciences and research. Vol. 6 (4).

**KIMALE,** Omer Riza (1978), *Elhib*, Suriya: Elrisale.

**MEHMUD**, Salar Ezîz, (2014), *Hizrî Felsefî le şiîrî Melayî Cizîrî da*. Hewlêr: Mûkriyanî.

**MIHEMED**, Xalid Cemîl (2006): *ElCizîrî Şair Elhib û Elcemal (Dirase).* Dîmeşq: Dar Elzeman.

**MIRADÎ**, Mihemed Hadî û **ÎLAHÎ,** Fatime Nezir, (2011): *"Elxezel Ind Ibin Elfariz û Camî"*, Micelet Îzaat Neqdiye, Camiet Azadî bi Îran, J. 1.

**MÛKRIYANÎ**, Hejar (2014), Dîwanî Melayî Cizîrî şerhî hejar. Tehran: Neşir Panîz.

**NÎWA**, Lok (1998), *Elmezheb Elbatinî fî Diynat Elalem*, (wer. Nihat Xeyat), Beyrot: Elcamiye.

**OMER**, Fazil (2004), *Nivêjek Mestane li dûr gunbeda Cizîrî*. Duhok: Weşanên Êketiya Nvîskarên Kurd.

**OMER**, Fazil (2017), *Cizîrî Û Desthelat Berev Tiyûriyeka Kurdî Bû Desthelatê*. Duhok: Nalbend.

**PAŞA,** Ekrem Cemîl (2007), *Dîroka Kurdistan*. Diyarbekir: Bîr.

**SEDÎQ,** Fuad (2015), Felsefe (Pêş Felsefe ts Mirdinî Nîçe), Hewlêr.

**ŞÎMIL**, Nîmarî (1379): *Elşems Elmintesire (Dîrase Asar Elşair Elîslamî Elkebîr Celaledîn Elromî)*, (wer. Îsa Elî Elrohanî). Tehran: Wizaret Elseqfe.

**XANÎ,** Ehmed (2004), *Mem û Zîn.* (amd. Arif Zêrevan), Stockholm: Nefel.

**XEZNEDAR**, Marif (2010), *Mêjûyî Edebî Kurdî (sedekanî Çiwardem-Hejdem)*, Berg I, Çap 2, Hewlêr: Aras.